# Nûntirîn agahî derbarê rewşa Sûriyê

Daîreya Koçberan ji ber guherîna rewşa ewlehiya Sûriyê li 9/12/2024 biryardana li ser dawayên penaberiyê yên welatiyê Sûriyê rawestand. Lê biryardan ji niha ve hatiye destpêkirin di mijara dawayên welatiyên Sûriyê yên ku ji ber hinek sebebên din dawa kiriye.

## Meşandin û biryardana hinek dawayan hatiye domandin

Meşandin û biryardan hatiye domandin

- di dawayên nûkirin û daîmîkirina welatiyên Sûriyê yên ku parastina navneteweyî wergirtî de
- di dawayên pasportên biyanî de ku dawakarên wan îqameya li ser bingehê parastinê li Fînlandayê nîne û
- di dawayên îqameya malbatî ya yekem de ku tê de herwiha derfeta pêdana parastina navneteweyî tê raçavkirin.

Biryar bi berdewamî hatine dan di wan mijaran de ku ne têkilî parastina navneteweyî ne, bo nimûne di mijara îqameyên karkirin û xwendekariyê de.

Di van dawayan de rewşa ewlehiya niha li Sûriyê nayê nirxandin çunkî sebebên dawayan ne nirxandina parastina navneteweyî ye.

## Vegerîna dilxwazane bo Sûriyê

Eger bixwazî vegerî Sûriyê, ev vebijark li pêş te hene:

1. Eger li ser bingehê parastina navneteweyî îqame dabe te, dikarî bi dilxwazî vegerî Sûriyê. Hingê dikarî Daîreya Koçberan ji vegera xwe agahdar bikî. Forma "Ragihandina vegerîna welatê xwe" dagire. Daîreya Koçberan dê îqameya te betal bike mafê te yê penaberiyê hilweşîne. Zêdetir bixwîne li ser Hilweşandina pamfê penaberiyê û parastina pileya duyem.
2. Eger dawa te ya penaberiyê berdewam be û bixwazî vegerî Sûriyê, divê ku dawa xwe betal bikî, Zêdetir bixwîne li ser Betalkirina dawayê.

Dikarî bo vegerîna Sûriyê alîkariyê wergirî. Zêdetir bixwîne li ser Nûtirîn agahî derbarê rewşa Sûriyê.

## Em bi berdewamî çavdêriya rewşa Sûriyê dikin

Li Sûriyê desthilat û rewşa ewlehiyê li dawiya sala 2024 guheriye. Em çavdêriya rewşa wî welatî dikin û agahiyên xwe yên ku tesîrê li mişteriyên Daîreya Koçberan bikin li ser malpera xwe ya Nûtirîn agahiyên derbarê Sûriyê nû dikin. Malper herwiha bi erebî û kurmancî ye jî.